



Folkhälsomyndigheten

TILL DIG SOM HAR DAGLIG HJÄLP AV HEMTJÄNST, FEBRUARI 2024, KURMANJI

Bo wan kesên ku wan rojane Hemtjänst (alîkariya malê) divê

Folkhälsomyndigheten (Dezgeha Tenduristiya Gel) ji bo kesên ku 65 salî û mezintir in û hewcedarê lênerîna kesane ya Hemtjänst'ê yan hewcedarê alîkariya wek vê ne, vê biharê dozeka aşiya li dijî Covid-19 bo wan pêşniyar dike. Ev ji bo kêmkirina rîska hewcedariya lênerîna li nexweşxaneyê ye.

Salê du caran xwe aşî bike

Her kesê ku 65 salî û mezintir e û hewceyê lênerîna kesane ya ji Hemtjänst'ê ye, tê pêşniyarkirin ku salê du caran, hem li biharê û hem jî li payizê, li dijî Covid-19 derzî bibin. Ew ên ku her roj hewceyê alîkariyê bi lênerîna kesane ne, heger hûn bi Covid-19'ê bikevin, li gorî kesên din metirsiyeke mezintir heye ku hûn bikevin nexweşxaneyê. Ev, bêyî ku sedema hewcedariya we bi alîkariya malê hebe jî derbas dibe.

Ev pêşniyar ji bo hemî kesên 80 salî û mezintir jî derbas dibe.

Heger hûn hem aşî bûbin û hem jî we Covid-19 girtibe, parastinek we heye

Heger payiza par we xwe aşî kiribe û piştî 1ê Çiriya Yekem we Covid-19 jî hebe, hûn dikarin di demsala bihar û havînê de jî xwedan parastineka baş bin. Ne gerek e ku hûn li biharê dozeka aşiyê ya nû werbigirin, lê hûn dikarin li payizê doza xwe ya din bigirin.